ÇÎROKÊN KLASÎK ÊN ZAROKAN

CILÊN NÛ YÊN QRAL

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran...

Hebû tunebû... dibêjin carekê li welatekî qralekî qure, kuşpene hebû. Derd û kulê wî tenê ew bû ku bi cilûbergên xweşik xwe bixemilanda. Îca wî her saetê carekê diçû cilê xwe diguherand û xwe bi cilên nû nîşanî derdorê dida.

Ev xûy û tebîeta qral êdî derveyî sînorên qraliyetê jî olan dabû. Rojekê, du sextekarên hoste hatin seraya qral û gotin: “Em du pîşekarên şareza ne. Piştî çend salên lêkolînê, ji bo raçandina qumaşekî pir sivik û tenik me pergaleke şoreşgerane peyde kir. Îca ew qumaş wisa sivik û wisa tenik çêdibe ku mirovên ehmeq û kesên ne layiqî mewkiya xwe nikarin wî bibînin! Yanî qumaşê me ji mirovên wisa re xuya nake!”

Şefê nobedaran xeber şand berdevkê serayê. Berdevkê serayê çû ji serokwezîr re got. Serokwezîr jî bi bazdan xeber gihand qral. Qral jî wisa meraq kir wisa meraq kir ku got bila hema zû wan herdu zilaman bînin cem wî.

--“...û tabî, Majeste, ev qumaş, hem ewê nedîtbar be, hem jî ji bo we emê wê bi reng û desenên pir taybet çêkin!” got herdu sextekar ji qral re.

Kêfa qral pir hat, rabû çewalek pereyê zêrîn da wan û ji wan xwest ku hema wê kêliyê dest bi xebatê bikin û ji wan re got: “Ji bo çêkirina wî qumaşî pêdiviya we bi çi hebe bibêjin, ewê di cih de pêk were!”

Herdu sextekaran hevrîşimê saf, tayê zêrîn û tevnek xwestin. Piştî ku tiştên pêwist hatin peydekirin, wan herdu sextekaran xwe wekî ku dest bi xebatê kiribin nîşan dan.

Di vê navberê de qral difikirî ku wî pereyê xwe ji bo tiştekî pir baş xerc kiriye: çimkî ne tenê ewê bibûya xwedî cilûbergekî muhteşem, ewê hîn bibûya ka kî, ji nav tebayên wî, ehmeq û ne layiqî meqama xwe ye. Piştî çend rojan, qral bangî serokwezîrê xwe kir û ferman da got:

--“Ka here binêre karê raçandina qumaş çawa dimeşe! Pişt re jî were agahiyê bide min!”. Serokwezîrê kal ku bi zanîn û tecrûbeyên xwe dihat naskirin, çû cem wan herdu sextekaran.

Bi hatina serokwezîr, herdu sextekar rabûn ser xwe, xwe çivçivandin û gotin:

--“Karê me pir baş dimeşe! Lê belê pêwistiya me hê zêdetir bi tayên zêrîn heye! Ekselansê min, ka li van rengan binêrin! Ka hîs bikin ev qumaş çiqas sivik e, çiqas tenik e!”

Serokwezîrê kal, xwe li ser tevnê xwar kir û hewl da ku bi hûrbînka xwe baştir li qumaş binêre, lê tu qumaş mumaş tunebû li holê! Xweydan ji eniya wî dilop dilop hatin xwarê. Ji xwe re got:

--“Hey wax li min! ez tu tişt nabînim! Ez niha bi rastî jî ehmeq im!? An jî ez ne layiqî meqama xwe me!?”.

Lê eger serokwezîr li xwe mikur bihata, eger ji qral re bigota ku tu tişt nedîtiye, ewê di cih de ji serayê bihata avêtin û wî ê nikaribûya careke din piyê xwe biavêta serayê.

--“Çi qumaşê muhteşem! Ez ê qral ji vê haydar bikim!” got serokwezîr û çû cem qral. Plana herdu sextekaran bi kêr hatibû. Ji ber plana xwe herdu sextekar pir kêfxweş bûn û keniyan.

Rojekê, ji bo ku cilê nû yê qral pîvanê bigirin, van herdu zilaman daxwaz kir ku herin cem qral. Qral daxwaza wan pejirand got:

--“Werin, werin, kerem bikin!”

Herdu terziyên sextekar hatin, xwe li ber qral tewandin. Wekî ku di hembêza wan de topek qumaş hebe, wisa tevdigeriyan. Û gotin:

--“Ka li berhema keda me binêrin, Majeste. Em bişev û biroj xebitîn, axir me qumaşê herî bedew ê dinyayê çêkir. Ka hele li rengê wî binêrin... Ka hîs bikin... çiqas nerm û sivik e!”.

Qral ne rengek didît, ne jî tu tişt hîs dikir. Feqîro bi carekê şewişî û hindik ma ji dil ve biçe.

Baş bû ku textê wî nêzî wî bû. Wî bi textê xwe girt, rûniştt, lê pişt re zûzûka xwe da hev. Diviyabû tu kesî nizanibûya ku ew wî qumaşî nabîne û ew qralekî ehmeq e. Lê feqîro nizanibû ku kesên derdora wî hemû di eynî halî de ne û hemû jî eynî wekî qral tevdigerin. Lîstika wan herdu sextekaran ha wisa bi dilê wan dimeşiya.

Du terziyên hîlebaz, piştî ku pîvana qral girtin, îca dest bi fesilandina qumaşî kirin... Meqesên wan di dest de, qumaşê nexuyayî çeq û çeq, çeq û çeq fesilandin û cilûbergê nexuyayî dirûtin.

Piştî ku cil amade bû, herdu zilam ji qral re: "Majeste, niha divê hûn xwe tazî bikin ji kerema xwe, da ku em cilê we yê nû li we bikin." Wan herdu sextekaran kincên nû yên nexuyayî li qral kirin û neynikek jî girtin ji bo ku qral xwe di neynikê de jî bibîne. Bi rastî jî, qral pir şerm dikir ku xwe di neynikê de û li ber ewqas mirovan tazî didît. Lê belê ji ber ku tu kesî wekî ku tiştekî nelirê û ecêb tunebe tevdigeriya, qral jî xwe pir rehet nîşan dida. "Erê, bi rastî jî, ev cilekî pir delal e û gelek li min hat ha!", got qralê feqîr.

Îca Serokwezîr got: "Majeste, haya gelê me jî ji vî qumaşê muhteşem çêbû û ew jî dixwazin we bi cilûbergên we yên nû bibînin!". Qral ket dudiliyê û ji xwe re got: "Ezê çawa xwe wisa tazî nîşanî gel bidim!" Lê piştre zûzûka wî ew guman ji serê xwe avêt. Ev çi sosret bû! Wî xwe tazî didît, lê wekî ku tu kesî tiştekî ecêb ferq nedikir. Îca qral got: "Temam. Baş e. Ez daxwaza gel di ser her tiştî re digirim!". Wisa got û rabû ferman da ku siwareya wî ya taybet bila bê amadekirin, û siware amade bû.

Komek giregir di serê kortejê de cih girt, qral jî li dû wan di siwareya xwe ya taybet de. Temaşevanan hewl dida werin pêş ji bo ku qralê welatê xwe û kortejê baştir bibînin: Ji bo korteja qraliyetê, demeke dirêj çepik hat lêdan. Yeko yeko herkesî dixwest bibe şahidê ehmeqî û bikêrnehatina cîranê xwe; lê belê, qral her ku zêdetir nêzî wan bû, miremir û pistepist ji nav qelebalixê bilind bûn. Hemûyan hewl dida ku ji aliyê derdorên xwe ve bên bihîstin û digotin: "Loo! Ka lê binêre! Çiqas delal e cilê nû yê qralê me!". "Ka li dawa wî binêre lawo, çiqas delal e!" "Ka hele li rengan binêre, li rengan! Rengên vî qumaşî çiqas xweşik in! Heta niha tiştekî wisa qet nehatiye dîtin!" Her yekî hewl dida fikrê xwe yê rastîn ji derdorê veşêre û bila kes nizanibe ku ew cilê qral nabîne. Ji ber ku tu kesî ne dixwest xwe ji kesên din re wek ehmeqekî nîşan bide, ne jî dixwest nîşan bide ku ne layiqî meqama xwe ye.

Lê belê zarokekî ku ne xwedî meqamekê bû û tirsa wî jî ji tu tiştî tunebû, nêzî siwareyê bû û bi qîrîn got: "Ka lê binêrin, qral tazî ye!".

Bavê kurik gazî kir û bi dû de beziya û got: "Tiştên wisa ehmeqiyê nebêje, ehmeqê ehmeq!" Û bavê kurik bi milê wî girt û bir. Pêşî ew gotin bi miremir, piştre jî bi dengên bilind di nav qelebalixê de belav bû:

--Erê welle rast e: qral tazî ye! Ma hûn nabînin, tiştek li ser wî tuneye! Qral şilf û tazî ye!

Qral fam kir ku gel mafdar e, lê belê wî nikaribû wê kêliyê ew rastî qebûl bikira. Ji bo wî tiştê herî baş ew bû ku merasîm bidomiya û wekî ku hemû kesên ku ew tazî didît, dixelitin. Û qral di nav siwareya xwe de, bi awayekî pir bixwebawer rabû ser piyan, û li pişt wî jî zilamekî wî dawa wî ya nexuyayî bi nazikî digirt û dibişirî.

Çîroka me qediya,

xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.